Newroz

Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

Hejmar (86) Hizêran 2009 z - 2621 k Buha (15)

Ji konferansa rêxistina Ewropa ya parta Yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê re….

Mîvanên rêzdar …

Endamên birêvebiriya konferansê…

Hevalên hêja…

Silavên biratî û hevaltiyê ji we re hene, hêvî ew e ku, karûbarê vê konferansa we ya pîroz û bi rêkûpêk biçe serî û serkeftî be, û li ser riya xebata di ber gelê Kurd de li Sûriyê pêngaveke erênî, kêrhatî û nûjen be.

Û hêjayî gotinê ye ku, lidarxistina ewqas konferansên şax û rêxistinan li gelek welatên Ewropî û helbijartina nûner û komîteyan bi şêweyeke demokratîk -li gor tozikê- ciyê şahî û pîrozbahiyê bû. Lewre jî, bawerî li cî ye ku, hûn dê karibin bi hev re, mil li mil, xebata xwe bidomînin, berfirehtir û geştir bikin, û li ser xal û jêderên xemsarî û kêmasiyan rawestin, da ku çareseriyan jê re bibînin.

Beşdarên birêz…

Hûn baştir dizanin ku, çendî rewş û heyam li Ewropa û Sûriyê di hemî waran de ji hevdu cuda û tersî hev in, lewre jî, pêdivî ew e ku , hemî xebat û çalakiyên we di çerçewa rêzgirtina zagon û qanûnên wan dewletan de bin, da ku dostanî, D.R. 11

Deng û Tîp
Memê Alan 3

Dibistan Têrm û têgeh
Heyder Omer 4

STÊRK
Nûredîn Ûsif 6

Nûseya xwendekaran
Anahîte Mûrad 9

Email : Newroz 95 @ hotmail . com